

**Ji bo Dêûbavên zarokên li kreşê
yan jî li hêlînên zarokan yên rojê**

27ê Nîsana 2020an

Agahiyên di derbarê gav bi gav berfirehkirina xebata lênêrîna zarokan li welatê Berlinê

Stî û mîrzayên rêzdar,
dêûbavên hêja,

em dizanin, ku ev ji mehekê zêdetir e, hûn û zarokên we bi awayekî mecbûrî astengiyên cidî yên rojane qebûl dikin, da ku hem komên di rîskê de parastî bin, hem jî belavbûna pandemiya, ku dikare bandorên nerênî li ser pergala me ya tenduristiyê bike, di bin kontrolê de bê girtin. Em her wisa dizanin, ku ev yek ji bo we çiqas zehmet in, ango ji ber daîreyeke biçûk, ji ber nebûna baxçeyekê, ji ber qadên lîstîkê yên di vê demê de mixabin girtî ne, ji ber ku hevalên we ne li cem we ne yan jî ji ber zehmetiyên din. Bi taybet zehmet e, ku mirov di heman demê de hem li zarokan binêre hem jî karê xwe bike û di ber de jî çî ji dest bê bike. Ev yek ne tişteki hêsan e û mirov pê pir diweste.

Em spasiya we dikin, ku hûn di vê riya dijwar de hete niha bi me re ne û bi vî awayî we kedeke mezin ji bo hêdîkirina pandemiya daye.

Mixabin ji ber berdewamkirina pandemiya koronayê em hêj jî di rewşeke awarte de ne. Lewma divê gelek astengî berdaw bin. Ji ber vê yekê hêj jî daxwaza ku li malê li zarokan binêrin berdewam e.

Ji bo ku em bikaribin van astengiyên bi qasî ji dest tê kêmbigirin, Senatoya Berlinê bi rêkûpêkî dinêre, ka guherînên li gorî Rêzîknameya Pîvanên Hêdîkirinê pêkan in.

Li ser vê bingehe di 21ê Nîsana 2020an de biryar li ser guhertinên rêzîknameyê hatin standin, ku pêr ketin meriyetê. Rêbazên nû ji niha û pê de derfetê didin, ku gav bi gav xebata lênêrîna zarokan ya li

hêlîna zarokan ya rojê bi şertên lînêrtina acîl werin berfirehkirin. Ev ji bo me tevan çêtir e, ku em gavên pêş bi haydarî biavêjin, da ku pergala lînêrînê bikaribe fonksiyona xwe biparêze.

Piştî 27ê Nîsana 2020an bi taybet zarokên kesên di komên li jêr de dikarin herî pêşî mafê lînêrîna li kreş û hêlînên zarokan yê rojê bi kar bînin:

- **Dêûbavên, ku di pîşeyê de fermiyetê de bi sistemê ve girêdayî ye de dixebitin** (li gorî lîsteya sererastkirî ya pîşeyên xwedî maf / li pêvekê binêre); Rêbaza-Du-Dêûbavan ya hete niha betal bûye
- **Tevahiya dê-bavên tenê** (ev tê wateya dê yan jî bavên ezeb, jinebî/mêrebî, yê demdirêj cuda dijîn yan jî dev ji hev berdane û ne bi kesekî temenmez re, lê belê bi zarokê xwe re yan jî bi zarokên xwe re di nav maleke daîmî de bi hev re dijîn.)
- Dêûbavên, ku zarokên wan yê bi astengî ku pêdiviya wan bi piştgiriyeke gelek zêde heye (ango Statûya-B)

Em dixwazin gavên din yê ji bo vekirinê biavêjin, mînak ji bo zarokên, ku îsal dest bi dibistanê dikin, û divê ev yek bi lez pêk were, lê bi awayekî ku teqez rewşa epîdemiyolojiya welatê Berlinê li ber çavan were girtin.

Ji ber armanca kêmkirina têkiliyên civakî pêvajoya berfirehkirinê derfetê dide, ku xebata lînêrînê bi awayekî bi sînor bidome. Ji bo bikaribin vê yekê pêk bînin, sazî û xebatkarên lînêrîna rojê xebata xwe ya lînêrînê bi awayekî bi sînor li gorî vê yekê bimeşînin. Ev tê wateya, ku mînak belkî demên vekirî biguherin, demên lînêrînê ne li gorî kuponê be yan jî saet an jî rojên lînêrînê ne bi rêkûpêk bin.

Ji kerema xwe re bila di hişê we de be, ku her têkiliyeke din ya xeynî malbatê rîska enfeksiyonê ji bo zarokê we û pê re jî ji bo we bilind dike. Ji ber vê yekê her binêrin, ka hûn dikarin alîkariyeke lînêrînê bi awayekî şexsî, bi taybet ji cîranan wekî alternatîv ji derfeta pêkan ya piştî 27ê Nîsanê re bibîbin.

Ji kerema xwe re di dema standina her biryara xwe de tenduristiya xebatkarên, ku li kreş û hêlînên zarokan yê rojê dixebitin, bidin ber çav. Bi vî awayî daxwaza me ji we ev e, ku dema we zarokê xwe anî hêlînê û dema hûn hatin peyî zarokê xwe hete ji destê we bê li ber derî bisekinin û zêdetirê ku pêwîst e li hundir nesekin. Hete ji destê we bê bila tenê kesek zarok bîne û bibe. Hûn dikarin bi zarokê xwe re li ser rewşa îroyî biaxivin, di derheqê meselê de û tiştên ku dê bi vê meselê re biqewimin bi zarokê bidin fêmkirin.

Ku zarokê we hêj nû dest bi hêlînê bike yek ji we, ango dê yan jî bav, dikare bi tevgera li gorî rêbazên hîjyen û mesafegirtinê li cem zarokê bimîne.

Dêûbavên mafê wan yê xwedîkirina zarokan heye, yê ku lînêrtina acîl bi kar tînin, bila ji kerema xwe re di serî de bi xebatkarên li kreş û hêlînên zarokan yê rojê re bikevin tekiliyê ji bo tevdîrek were standin. Hûn dikarin ji xebatkarên re bibêjin, ka kengê çavdêrî ji bo zarokê we pêwîst e.

Helbet dema, ku zarokê we nexweş be yan jî nîşaneyên nexweşiyê yê ne diyar pê re hebin nikare were kreşê û hêlînên zarokan yê rojê. Ger gumanek hebe destûra ku rapora bijîsk bê xwestin heye.

Ji kerema xwe re ji bo pirsan, meroq û agahiyan hûn bi rêvebiriya koma dêûbavan re yan jî bi komîtêya dêûbavan a welêt re (info@leak-berlin.de) bikevin têkiliyê, ji bo ku ew jî bikaribin rewşa di nav malbatan de ji rêvebiriya senatoyê re bînin ber çav.

Ji bo gavên din yên li ser mijara çavdêriyê em ê agahî bidin we. Parastina tenduristiya me ji bo me hemiyan li ser her tiştî re ye. Ji kerema xwe re hûn jî ji bo çavdêriya zarokan alîkariya me bikin. Mala we ava be!

Li gel silavên germ

Peywirdar

Schulze